Mazlum arkadaşın mahkeme başkanıyla polemik ve tartışmaları çok yaşanıyordu. Çünkü heyet Mazlum arkadaşın konuşma yapıp parti ve Kürdistan savunmasını yapmalarını istemiyordu. Fakat Mazlum arkadaş da taviz vermiyor, konuşma ve hareketi savunmada oldukça ısrarlıydı. Mahkeme heyeti sürekli suçlamaları kabul etme temelinde bir dayatması oluyor-



du. Buna karşı Mazlum, Kemal ve Hayri arkadaşlar ile parti savunması yapan diğer tüm arkadaşlar ise şöyle diyorlardı; "Nasıl davranmamız, nasıl hareket etmemiz ve nasıl bir savunma yapmamız gerektiğini gayet iyi biliyoruz. Biz bu örgütün öncüleriyiz, bunlar bizim çalışmalarımızdır, profesyonel olarak çalıştık, malımız-mülkümüz yok, biz devrimciyiz, asıl sizin gerçekleri itiraf etmeniz gerek, sizin Kürt kırımı yaptığınızı itiraf edip özür dilemeniz gerek."

Direniş sırasında hep konuşuyorduk, 35. Koğuş deniyordu. Bu ismi devlet vermişti ama

orası koğuş değil hücreydi. Bazen yerlerimiz değişiyordu. Direniş sırasında yerlerimiz değiştirildiğinde Mazlum arkadaşla bir araya gelebiliyorduk, 8 aylık fiili direniş zamanı boyunca çoğunlukla beraberdik.

Ara sıra Mazlum arkadaş ve direnen arkadaşları başka yerlere götürüyorlardı ki, direniş zayıflasın diye. Esat Oktay direnişi kırmak için bazı görüşmeler yaptı, direnişçiler de mahkemede savunma yapabilme koşullarını talep olarak ifade ettiler. Yani "parti ve Kürdistan savunması yapmamıza izin verseniz biz de bazı şeyleri ka-

bul ederiz” şartı koşuldu. Daha sonra Esat Oktay ve işkenceci güruhu verdikleri hiç bir sözü yerine getirmediler.

### Tarihe direniş ile aynı cümleye adını yazan bir öncü

Günler birbirini izliyordu, her geçen gün koşullar daha ağır, dayanılmaz bir hal alıyordu, işkencenin dozajını en üst seviyeye çıkarıyorlardı. Bu durum bir yıl boyunca devam etti. İşkence artıyor, zindanda onurlu yaşama koşulu kalmamıştı, ağır bir durum vardı. Mazlum arkadaş bunun böyle gitmeyeceğini düşünüyordu. Çünkü Esat Oktay için kurallar bitmiyordu, hedefi doğrudan herkesi teslim alıp ihanet ettirmektir. Bunun için ne gerekiyorsa onu yapıyordu. PKK’yi terörist, eşkiya çetesi, Ermeniler tarafından kurulan bir örgüt olarak görülmesini ve bunun mahkemelerde ifade edilmesini istiyordu. Esat Oktay Yıldırım bunu çok açık ve net bir biçimde tutsaklardan istiyordu. “Ya mahkemelerde itiraf edecek ya da hepiniz burada öleceksiniz” diyordu.

Mazlum arkadaş kurulan bu işkence ve ihanet sistemini konuşarak, müzakere yaparak bozulmayacağını anlamıştı. Esat Oktay “gelin örgütüne katılın, ‘Genç Kemalistler’ diye bir örgüt kurdum, gelin katılın” diyordu. Bu grupta Şahin Dönemz, Yıldırım Merkit, Hıdır Akbalık gibi düşmüş, itirafçı olmuş kişilikler vardı. Esat Oktay, Mazlum arkadaşına “gel bu örgütün, grubun lideri ol” diyordu.

Büyük bir korku imparatorluğu yaratılmıştı. Bu korku içinde düşenler oluyordu, ha-

“Bilgi olmadan, bilinç, doğru bir bakış açısı, doğru bir perspektif olmadan devrimcilik yapmak, daha doğrusu devrim yapacak bir devrimci olmak mümkün değildir. Devrimimizin yarısı bilmek, anlamak, kavramak, öze yedirmek ve doğru bir bakışa sahip olmaktır”

yatını kurtarmak , bu bitmek bilmeyen ağır işkencelerden kurtulmak için teslim olanlar oluyordu. Öyle bir durum vardı ki işkenceci Esat Oktay Yıldırım ve Türk devletinin elinden kurtulmak artık mümkün görünmüyordu, çaresizlik vardı. Mazlum arkadaş bu durumu gördü. Arkadaşlarla konuştu, zindan koşullarını değerlendirdi, ortak bir direnişi oluşturmak, herkesi bu direnişe katmak istiyordu. Fakat koşulların durumunu, arkadaşların içinde bulunduğu ağır hali gördü, herhangi bir eylem tarzıyla direnişin olmayacağını anladı. Mazlum arkadaş bunları gördü, analiz etti ve fedai bir eylem kararına vardı. Mazlum arkadaş fedai eylem yapan ilk kişi olarak tarihimizde yerini aldı.

Mazlum bir kıvılcım çakmak istedi. Her yer karanlıktı ve o karanlıkta artık kimse kimseyi görmüyordu. Yol kaybedilmişti, fikirler allak bullaktı, ihanet kol geziyordu. Bir yol lazımdı, bir de kıvılcım. İşte 21 Mart 1982 Newroz günü Mazlum arkadaş üç kibrit çöpü yakarak kıvılcım olup zifri karanlık olan yolu aydınlatmak istedi.

Ve gerçekten de hem yol aydınlatıldı, hem zindanın kötü gidişatı değiştirildi, hem tutsaklarda yeniden direniş perspektifi oluşturuldu, hem de

teslimiyet ihanete direniş zafere götürü gerçekliği temelinde parti tarihi yeniden yazıldı. Tek bir eylemle, yani gerçekleştirdi fedai duruşla deyim yerindeyse parti tarihini, direniş ve teslimiyet tarihini yeniden yazdırdı. “Mazlum’dan önce Mazlum’dan sonra” diyebileceğimiz yeni bir süreci temeli atıldı.

Gerçekten de eylemden sonra her şey değişti. PKK tarihi farklı bir okumaya tabi tutulmaya başlandı, Newroz yep yeni bir içerik ve anlam kazandı. Direniş ve yaşam artık farklı bir şekilde ele alınmaya başlandı.

Eyleminin mesajı çok açık ve netti: “Teslim olmayacağız, ihanete karşı duruşumuz sert olacak, Kürt ve Kürdistan gerçekliği bir realitedir, kimse inkar edemez, gerektiğinde bu uğurda kendimizi feda edebiliriz. Tek kurtuluş yolu PKK’den geçer, bunun dışında kurtuluş yolu yoktur, olamaz. ‘PKK dışarıda, Diyarbakır’ın Lice’nin Fis köyünde kuruldu Diyarbakır Cezaevi’nde bitti’ denilmesin diye gerekirse hepimiz burada, bu zindanda ölmeliyiz. Bir PKK’li asla teslim olmaz, kimse onu teslim alamaz.”

Ve böyle de oldu. Yani Mazlum arkadaş ne düşündüyse o yapıldı, neyi öngördüyse o gerçekleşti. ●●●



## HÛN NIKARIN ROJA ME TARÎ BIKIN

**T**êkoşîna Azadiya Kurd û Kurdistanê ku ghiştîye niv esrê, ji destpêka avabûnê heyânî roja me ya îro ji gelek pêvajoyên zehmet derbas bû. Di van pêvajoyên herî zehmet de jî gelek qehremanên azadiyê ku laşê xwe li hemberî dagirkeriyê kirin mertal, bi berxwedaniyên xwe û bi seknên xwe yê dîrokî xwedî cihên pir girîng in. Bi têkoşîn û berxwedaniya wan qehremanên giranbûha gelek caran pêvajoyên nû ji têkoşîna azadiyê re hat vekirin. Ev berxwedana bê hempa ya meşa 43 salan e berdewam dike û bi biryardariyeke pir mezin diherike ghişt roja me ya îro.

**Ew rihê ku digotin miriye, êdî mîna darekî pûç nikare zindî bibe zindî bû**

Rastî ew e ku, faşîzm dikare di warê fizîkî de beden qir bike, dîl bigre. Bi şeweyên cûr be cûr weke ku di dîrokê de jî xuya dike vê qirkirinê li ser gelê Kurd jî

pêkanîn. Lê divê tu caran neyê jibîrkin ku rih, dil û mêjiyê ku bi biryardarî û hêviyên ghiştîna azadiyê diperte tu caran nikare were qirkirin û dîlgirtin. Têkoşîna azadiyê ku bi pêşengtiya Rêber APO destpêkiriye, ew rih, dil û mêjiyê ku bi biryardarî û hêviyên ghiştîna azadiyê ji bo gelê Kurd jî nû de zindî kiriyê. Ew rihê ku digotin miriye, êdî mîna darekî pûç nikare zindî bibe zindî bû û bi birdozîya Rêber APO ku xwe dispêre civaka demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê di nav têkoşîn û berxwedana bê hempa de ye.

Lewra weke pêşengê xeta azadiyê komlo û pêvajoya qirkirin û tunekirinê ya ku di şexsê Rêber APO de li ser gelê Kurd dihat ferzkirin di dîroka 9'ê Cotmeha 1998'an bi awayekî hîn şênbertir rû da. Lê weke ku her kes dizanî, ew rihê ku bi pêşengtiya Rêber APO di civaka Kurd de bilind dibû û radibû serhildanê, wê tu hêz nikaribûya bisekinîne. Li hemberî vê pêvajoya qirkirin û tunekirinê li Kurdistan û

gelek deverên cihanê çalakiyên cûr be cûr pêşketin. Gelê Kurd bi dirûşmeya 'Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin' li derdora Rêber APO bûn xelekek ji agir. Bi vê awayê xwestin di şexsê Rêber APO de têkoşîna azadiya Kurd û Kurdistanê û destkeftiyên ku hatiye bidestxistin biparêzin.

Agirê destpêkê yê ku bi dirûşmeya 'Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin' hat pêxistin li girtîgeha Mereşê bilind bû. M. Halît Oral di 9'ê Cotmeha 1998'an de bi îradeyek mezin a ku mirov nikare pênaseya wê bike laşê xwe da ber agir, qir kir û got 'Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin'.

Di pêyama xwe ya li pişt xwe hişt de wiha got; 'Bê guman ev çalakî wê neke ku dewleta Tirk gav paş de bavêje, lê ewê vê yekê baş bibînin ku ger hûn zirarek biçûk jî bibînin, wê gelê me tevahî dinê li serê wan hilweşîne. Ji ber ku ger îro cihan behsa me dike, ev bi giştî encamên ked û hewildanên we ye'.

## Derdora Rêber APO bûn xelekek ji agir

Dengê agirê laşê M. Halît Oral li her derê bilind bû. Çalakiyên bi dirûşmeya Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin li gelek zindanan din jî berdewam kir. Di 18'ê Cotmeha 1998'an de li zindana Bartînê bi Murat Kaya, di 19'ê Cotmeha 1998'an de li zindana Amasya bi Mehmet Gul berdewam kir û heyanî 24'ê Kanûna 1998'an di serî de li zindanan, li Kurdistan, Tirkiye, Rusya, Kibris, Elmanya, Îtalya û heyanî Sûrî li her cihê ku Kurd lê dijîn ji 60'an zêdetir kesên ku dilê wan ji bo azadiyê lê did laşê xwe dan ber agir û xwedî li rêberê gelan Rêber APO derketin.

Yên ku li derdora Rêber APO bûn xelekek ji agir ne tenê kadroyên PKK'ê PAJK'ê bûn. Ji ciwanan heyanî kal û pîran hemu kesên ku dilê wan ji bo azadiyê lê dide tevlî çalakiyan bûn, bi agirê laşên xwe bersiva herî mezin û bi wate mîna pepûleya çaremîn dan dost û dijminên xwe. Bi vê awayê çalakiyên Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin bi civakbûnê re hemû beşên civakê girt nav xwe. Di 13'ê Mijdara 1998'an de Cemîl Ateş ji bo Rêber APO agir berda laşê xwe, Mîrza Çubukçu yê emrê wî ji 60 salî zêdetir bû bedena xwe ji bo rojîya mirinê da razandin.

## Hatîce Falat

Di 13'ê Kanûna 1998'an de Hatîce Falat ji bo dengdayîna çalakiyan bedenê xwe da ber agir. Hatîce Falat a 60 salî ku gûndên wan ê li Elihê ji aliyê dewleta Tirk ve hatibû şewitandin, yek ji dayikên aşitîyê ya destpêkê bû. Dema ku li ser televîzyonê dibîne ku Rêber APO ji aliyê dijminê mirovahiyê ve dîl hatiye girtin bi gotina 'Cîhana me tarî kirin', li Gungoren a girêdayî Stenbolê laşê xwe da ber agir.

## Serpîl Polat

Ji şoreşgerên Tirkiye Serpîl Polat jî dema ku dibîne ji aliyê hêzên navnetewî ve komployek hevpar tê pêkanîn, berteka xwe ya li hemberî komployek bi tevlîbûna çalakiyan nişan dide. Serpîl Polat a nûnerê rûmetê ya Yekîtiya Propagandaya Çekdarî ya Marksîst-Lenînîst di 17'ê Sibata 1999'an de li girtîgeha Sakarya laşê xwe da ber agir. Serpîl Polat Di pêyama xwe de wiha got: "Ez êrişên emperyalîzm, oligarşiyê ku di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de bi taybetî li hemberî gelê Kurd, bi giştî li hemberî gelan tê meşandin şermezar dikim. Bi diyarkirina ku wê Rêber Abdullah Ocalan neyê dadgehkirin, xwe amade dikim ku bi mezinahiya

agirê bedena xwe hêrsa xwe ya mezin li ser dijmin vedirêjim. Ez dibêjim ku ev ne qûtûnek e, berovajî hevdişînek e".

## Serdar Ari,

li Girtîgeha Tîpa F ya li Buca ya girêdayî Îzmîrê di 25'ê Cotmeha 2005'an de tevlî çalakiya 'Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin' bû. Ari di nameya xwe de cih da van gotinan; "Bi tecrîda tunekirinê ya ku li ser we tê meşandin ve tê xwestin ku gelê me, gelan ji nû de were kolekirin. Ewqas nixrên ku we ava kiriye tê xwestin di carekê de were tûnekirin. Lê ne gengaz e ku em vê yekê qebûl bikin û bedela wê çi dibe bila be emê qebûl nekin. Nêzî 21 hefteyan e em ji we agahî nagrin. Ev me dixê nav fikaran û bi hêrs dike. Em dizanin ku azadiya gelê Kurd tenê û tenê di azadiya Rêber APO re derbas dibe. Ji ber vê jî weke ku di demên derbasbûyî de, îro jî erkên ku dikeve ser milê xwe pêk tîne".

## Aynur Yaşli,

di 30'ê Adara 2006'an de bedena xwe da ber agir. Ji bo protestokirina 14 gerîlayên ku li Muşê hat qetilkirin û piştra terora dewletê ku li hemberî serhîlanên Amed, Elih û Mêrdînê destpêkir hat pêkanîn, çalakiya



xwe pêk anî.

### Veysî Kaya,

ya ji gelê Erebb, di 28'ê Sibata 2006'an de ji bo protestokirina tecrîda li ser Rêber APO bedenê xwe da ber agir.

### Hukmiye Seyhan,

di Kanûna 1999'an de bedena xwe da ber agir. Di nameya xwe de ji bo gelê Kurd cih da van gotinan; "Bi salan e we ê û azarên mezin jiyan kir. Hûn bi dagirkeriyek dijwar re rû bi rû man. Êşên bê welatî, tûnebûn, koçberiyê we jiyan kir. Li Kurdistan dergûşa mirovahiyê we singa xwe ji zehmetiyên herî bê eman ê dîrokê re vekir. Û bi komploya ku li hemberî Rêber APO yê hûn cara destpêkê dibin xwe-diyê rêberek wisa hat pêkanîn, hat xwestin ku hûn bê Rêber bimînin. Dêdorên emperyalîst û paşverû yê bi komploya navnetewî Rêbertiya me, Rêber APO ku li dijî jiyana kevin a koletiya Kurdan derket û rê nîşan da, teslîmî Tirkîye kirin; rûxmê ku di dîrokê de cara ewilî rêya me ronî bû, xwestin di şexsê Rêber APO de pêşeroja me tarî bikin. Ew Roja me ye".

### Nesrîn Teke,

ya di 1981'an de li Amed'ê jidayîkbû, nûnerê buroya kovara Ozgur Halk a Amedê bû. Nesrî Teke bi tevlibûna çalakiya Hûn Nikarin Roja Me tarî Bikin, di 9'ê Tirmeha 2000'an de şehîd

bû. Dema ku li ber çavên dayîka xwe çalakiya xwe pêk anî, ji dayîka xwe re gotibû 'tuyê piştî wateya çalakiya min fêmbikî'.

### Esen Aslan,

a xebatkarê kovara Ozgur Halk, li dijî komploya navnetewî ya li hemberî Rêber APO hat pêkanîn û polîtîqayên tunekirinê yê li ser gelê Kurd tê ferzkirin di 3'ê Tebaxa 2000'an de bedena xwe da ber agir.

### Rêheval Viyan Soran,

(Leyla Walî Hesen) di 1'ê Sibata 2006'an de li hemberî komploya navnetewî ya li ser Rêberê Gelan Rêber APO hat pêkanîn û bi vî awayê hat xwestin li ser gelê Kurd polîtîqayên qirkirinê were ferzkirin, bedena xwe da ber agir. Rêheval Viyan a Endamê Meclîsa HPG û YJA-Star'ê di nameya xwe de cih da van gotinan; "Dibe ku hûn bi gotina 'te çima çalakiyek wisa pêk anî' min rexne bikin, an jî dibe ku Rêber APO çalakiyek bi vî rengê qebûl neke... Di her şeva 15'ê Sibata de, dilê rêheval Mazlum Dogan, Zekiye Alkan, Bêrivan, Ronahî, Rehşan, Sema, Fîkrî Baygeldî, Serdar û bi hezaran şehîdan bi min re lê dide. Diruşmeya wan a 'Bijî Serok APO' her tim di dilê min de lê dide. Dibe ku hûn çalakiya min rexne bikin û qebûl nekin. Lê em ji we fêrbûn ku, bêyî bedel were dayîn azadî nayê bidesxistin".

### Elefterya Fortulakî,

di 24'ê Adara 2006'an de li Atîna ya paytexta Yewnanîstanê bedena xwe da ber agir. Elefteriya di nameya xwe bal kişand ku yek ji perpirsiyarên kompoyê dewleta Yewnan e cih da van gotinan; "Ez vî salê Newrozê pîroz dikim, lê hinek dereng. Weke Zekiye Alkan, Sema Yuce, Ronahî, Bêrivan, Rahşan Demîrel û gelek kesên din ên çalakiyên mezin pêk anîn. Biryardariya wan, gelê Kurd û Kurdistanê bilind kir. Dîroka Kurdan bilind kir. Li hemberî we û kesên ku ji Kurdistanê têkoşîn dikin rêza min heye. Kesek nikare Roja me tarî bike! Azadiya Rêber APO û gelê Kurd, azadiya tevahî gelên cîhanê ye! Bijî biratiya gelan!"

### Selamet Menteş û Aynur Artan,

di şeva 23'ê Cotmeha 1998'an de li Girtîgeha Mîdyadê bi kolo-yayê bedena xwe dan ber agir. Selamet Menteş li girtîgehê, Aynur Artan jî li nexweşxaneyê şehîd bû. Rêheval Selamet û Aynur di pîyama xwe de wiha gotibûn; "Parastina Rêber APO; bi rêya xwe derbaskirin û fêmkirinê re gengaz e. Parastina Rêbertî bi bûyîna yek deng, yek bedenê ve gengaz e. Parastina Rêber APO bi ghiştina alevên ku azad dibe gengaz e".

### Meral Kaşoturacak,

di 20'ê Cotmeha 1998'an de

"Parastina Rêbertî bi bûyîna yek deng, yek bedenê ve gengaz e.  
Parastina Rêber APO bi ghiştina alevên ku azad dibe gengaz e"



li Girtîgeha Çanakkale, Cennet Guneş di 24'ê Cotmeha 1998'an de li girtîgeha Entebê, Aysel Ceylan di 24'ê Cotmeha 1998'an de li Girtîgeha Sakarya, Azîme İnan di 16'ê Mijdara 1998'an de li Girtîgeha Elihê, Remziye Zengîn di 16'ê Mijdara 1998'an de li girtîgeha Elihê, Gulîstan Taş di 16'ê Kanûna 1998'an de li girtîgeha Elihê, Zehra Rizgar di 27'ê Mijdara 1998'an de li Rojhilatê Kurdistanê bi dirûşmeya Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin bedena xwe dan ber agir.

### Mehmet Aydin,

ku di 13'ê Mijdara 1998'an de li zindana Çanakkale bedena xwe da ber agir di pêyama xwe de wisa nivîsandibû; "Ji 9'ê Cotmehê şûnde ez fikirîm ku deqeyek bê APO ji bo PKK'ê, ji bo me tê çî wateyê. Encamên ku ez ghiştîmê pir hêwilnak in. Ji ber ku hêzên tarî vêya pir baş dizanin di nvaneda êrişên wan de hûn hene. Hûn yekîtiya me, sedemê hebûna me, binasiya hebûna me ne. Cewhera hemu êrişan ev e".

Çalakiyên ku piştî Rêber APO ji Sûrî derket destpêkir, li her cihê ku ew gav avêt berdewam kir. Dema ku Rêber APO li Roma ya paytaxta Îtalya bû welatparêzên Kurd ji bedenên xwe dîwar hûnandin û bi bûyîna topek agir xwedî li Rêber APO derketin.

### Remzî Akkuş

Yek ji çalakiyên ku di raya giştî de dengê mezîna veda piştî ku Rêber APO ji Rusya derket pêk hat. Rêheval Jêhat (Remzî Akkuş) û rêheval Tayhan (Ahmet Yildirim) di 17'ê Mijda-

ra 1998'an de li Moskovayê li pêşiya parlamentoyê, bedena xwe dan ber agir. Di nameya ku li pişt xwe hiştin wisa gotibûn; "Em talîmata Rêberê xwe yê netewî Rêber APO ku ji bo gelê me gotibû 'hesasiyeta xwe û hestiyariya xwe zindî bigrin, lê çalakiyên xwekûjî pêknêyînin', weke talîmatekî ku bingeha xwe ji taybetmeniya insanî ya herî diyar a Rêber digre qebûl dikin. Em diyar dikin ku bi hemu talîmatên wî re heya mirinê girêdayî ne û bi xwe sîpartine efukirina Rêber APO, bi qîrîkirina 'jiyanek bê Rêbertî û bê welat haram e' çalakiya xwe pêk tînin".

### Rêheval Bulent Bayram,

di 22'ê Cotmeha 1998'an de li zindana Semsûrê bedena xwe da ber agir. Di nameya xwe ya li pişt xwe hiştibû de wiha digot; "Li şûna hilbijartina mirinek hêsan, ez dizanim ku bi çalakiyek bi vê rengê ezê ji eniya zindanan darbeyek mezin li dijmin bixim. Girêdanbûn û baweriya min, berê min dide vê çalakiyê. Berxwedêrên 14'ê Tirmehê, rêheval Zilan, Sema, Fîkrî û Halîl Oral vêya emir dikin. Ez dixwazim bi çalakiya xwe nîşan bidim ku ez şopdarekî wan im û girêdanbûna xwe ya li hemberî wan qîr bikim. Ez ê jî bi ghiştîna xeta Rêbertî û rastiya şehîdan, bersiva êrişên tûnekirinê yê dijmin bidim. Bi qasî ku bersiva min li hemberî dagirkeriyê ye, li hemberî îxanetê ye jî".

Çalakiyên Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin, bi giştî di pêvajoya tecrîda Îmralî de berdewam kir. Di 18'ê Tirmeha 2011'an de Evrîm Demîr a 18 salî û di 15'ê Sibata 2018'an de li Konak a

İzmirê Nazelîn Korkut ji bo bersivdayîna komploya navnetewî bedena xwe dan ber agir.

Hêsan nîne ku mirov bika-ribe laşê xwe di oxira tiştêkî de bike topek agir. Lê dema ku mijar dibe azadî, dema ku mijar dibe hebûna gelekî, li hemberî Rêberê wî gelî êrişên giran ên faşîzmê hebe û ew Rêber di şert û mercên herî zehmet de ji bo azadiya gelekî têkoşînek bê eman dimeşîne wê demê di oxira jiyaneke bi rûmet de mirov dikare her tiştî bike. Weke ku Rêber APO jî dibêje 'Ger azadî hêsan bûya Ronahî û Bêrivan bedena xwe nedidan ber agir'. Ev gotinên Rêbertî rastiya bê eman a ku weke jin, gel û civak em di nav de dijîn ango êrişên qirîkirinê yê li ser me tê ferzkirin bi awayekî eşkere radixîne holê. Lewra yê ku dilê wan bi qasî Ronahiyan, Bêrivanan, Zîlanan û tevahî şehîdên azadî û rûmetê ku bedena xwe li hemberî dagirkeriyê kirine mertal ji bo azadiyê lê nede nikare vê îradeya mezin nîşan bide. Mîna pepûleya çaremîn ew ghiştîna wateya heqîqetê û bi hebûna xwe, bi têkoşîna xwe ya ji me re hiştine, bi agirê azadiyê ku li ser bedenên xwe pêxistine rêya me ronî dikin û dibin pêşengê şoreşa me, pêşengê têkoşîna me. Em jî soz didin wan şehîdên xwe yê bedew ku ew meşaleya azadiyê emê bigihînin serkeftinê û bi azadiya fizîkî yê Rêberê xwe Rêber APO û bi azadiya tevahî gelan ve tacîdar bikin.





## NEWROZ PÊNASEYA BIHARA AZAD A GELAN E

**M**eha Adarê bi despêkirina biharê re nûbûn û bişkivandinê, di çemê jiyane de herikandinê pênase dike. Dema ku beriya zayînê di sala 612'an de fikrên girîng ku di çemê dîrokê ber bi xaka Mezopotamya'yê ve diherikîn, xwe ber dida nav dilê mirovahiyê re. Lê çemek ji wan çeman jî hebû ku yê wekî Dehaq û Nemrûdan berhem û hebûna mirovatîyê, biratiya gelan bi rengê hovanê, bi hişmendiyekî faşîst dixistin meriyetê de û mirov dikare bibêje ku tovên faşîzmê di dema Dehaqan de hatiye çandin. Lê dema mirov xwe berde nav ra û rîşên dîrokê de, mirov dikare rastî gelek rewşên cûr bi cûr were. Dema mirov dîroka gelê Kurd hemû serpêhatiyên wê bide berçavan em ê bibînin ku; Dehaqên wê demê hebûn ya ku vîna mirovatîyê, pêşeroja wî, ciwanên wî heta çîrokên wî bi rengê mîtolojîk tê gotin an jî

tê behs kirin. Lê di heqîqeta xwe de Dehaq, faşîzma wê serdemê ye. Yê ku bi serê mirovan bircan çêdikirin, yê ku di nava gelan de tovên nîfaqê didan çandin, yê ku dixwestin ji bo xwe mirovan bikin qûrbani ku di bingeh de vîna morvahiyê tê çikandinê pênase dike. Li ser wê derketina Kawayê Hesinkar navnîşana çemê dîrokê yê ku biratiya dike yek, jiyana bi hev û din re pênase dike û li ser erdnîgeriya Mezopotamya jiyaneke hevbeş dide avakirin koka vê yekê jî di bêrîkirina dîrokê de veşartîye.

Li ser vê dema ku Dehaq dixwaze bi despêka biharê ve -ku nûjenbûna biharê bi taybet jî li ser erdnîgariya ku meydika mirovatîyê ye pênase dika- carekî din mirovan ji bo xwe bike qûrban. Ev yek xwînmêjbûna Dehaq dide nîşandan. Ew tovên wekî Dehaqan ku xwe serdest dibîne di heman demê de, vîna hemû netewên ku hene tûne

dike. Ji ber vê yekê ye ku mêjiyê zarokan û ciwanan dixwe. Ev mêji xwarin ne kirinekî ji rêzê ye ev yek; di milek de tûnekirina zarok û ciwanan pênase dike di milek de jî rêbazên gel tirsandinê dide nîşandan. Mêjiyên wan xwarin di bingeh de vîna wan xwarine û hafîza wan tûnekirin e. Ji ber mêji perçekî laş ya di mirovan de ya herî zindî û kêr hatiye. An go di laşê mirovan de ya herî ku dikare şixûl bike ye.

**Yên desthilatdar, xwestine ku di şexsê ciwanan de hewza wê ciwakî ji holê rabikin**

Çîrok di kûrahiya xwe de, di heman demê de di ra û rîşên di dîrokê de gelek wateyê xwe ye girîng heye. Bi taybet li ser têgeha "çima mêjiyê mirovan" tê xwarin sekinandin wê mijarê hemû ronahî bike. Mêji tê xwarin; ji ber ku di laşê mirovan de

tiştê herî kêr hatî mêjî yê. Di heman demê de di civakêkî de mêjî yê ciwanan tûnekirin tê wateya pêşeroja wî civakî tûnekirinê. Ji ber yê ku jiyanê dihûne, di jiyanê de nûjentiyê dide avakirin; dîsa yê ku heqîqetê di afirîne ciwan in. Dibe ku çîrok de bi vê rengê tê gotin lê ya girîng ewe ku her tim di dîrokê de, yên desthilatdar, xwestine ku di şexsê ciwanan de hewza wê ciwakî ji holê rabikin.

Dema mirov sala beriya zayînê 612'an mêyze bike; di Rojhilata Navîn de pêvajoya ku bazirganî pêş dikeve, dîsa pêvajoyên ku di nav gelan de şer gelek diqewimin, sermeyedarî pêş dikeve dîsa hemû kes dixwazin ji serê mirovan bircan çêbikin bi kûrtasî wek pêvajoya Nemrûdan e. Ji xwe dema mirov li çîroka Nemrûd û Dehaq temaşe bike; mirov bibîne ku çîrokên wan gelek ji hev û din ne cûda ne. Di salê de hinek demsal hene navnîşana nûjentiyê dikin. Bi taybet jî di Mezopotamya de cîhê ku li ber çemê Dicle û Firatê cîhê ku mirovatî, civakbûn pêkanîye, hemû tiştên ku bi biharê ve dişkive, xwe nû de ava dike û çêdike. Dîsa bi despêkirina biharê ve xweza xwe nû dike, zindî dibe. Ji ber vê yekê jî di berxwedanên dîrokê de li beramberî zilma ku ji milê hişmendiya desthilatdar de tê kirin; serdem û demsala serî rakirina ku derdikeve jî gelek girîng e. Di berxwedaniya Kawayê Hesinkar de jî ev rastî xwe dide nîşandan.

### **Newroz wateyê jiyanekî nû ye, “xwebûn e” û nûbûn e**

Di dîroka mirovatîyê de dû çem diherikin; yek jê çemê

heqîqetê ye û ya din jî çemê faşîzmê ye. Kawayê Heesinkar jî mîna çemê heqîqetê ku di dîrokê de ji bo biratiya gelan, netewa xwe parastin û li ser esasê jiyana nû avakirinê nîşan (temsîl) dike. Ger mirov rewşa Rojhilata Navîn û serdema ku hatiye jiyankirin bi lêv bikin, bikevin kûrahiya dîrokê de mirov wê rastî hişmendiya faşîzane tê. Ji ber wê Newroz wateyê jiyanekî nû ye, “xwebûn e” û nûbûn e. Ger em wek fikrên Rêber APO, Tevgera Azadiyê û Rojhilata Navîn ji bo serdema xwe Newrozê binirxînin; em karin bibêjin ku dema mirov serdema kevin û ya nû digihîjîne hev û din; em digihîjin lotika herî bilind ya pêvajoyê. Di vê sala ku em tê de ne em, salvegera Newrozê ya 2633'mîn pîroz dikin. Lê heya niha di serdema ku em tê de jiyan dikin jî Newroz ”bihara gelan ya azad û nû” pê-nase dike.

Di dîroka me ya Tevgera Azadiyê de hesinê Kawa bi cûreyekî hemdemîn ku li beramberî Dehaqên serdemê radike Heval Mazlûm Doğan'e. Heval Mazlûm jî dibe ku şeweyê wî cûda be lê armanc yek e. Ji ber ku dîsa Dehaqên vê demê mêjîyên ciwanan dixwin, ji heqîqeta wan dîrdixin, ji ra û rîşên wan yê dîrokê, ji netewa wan

û ji zanista wan dîr dixin. Heval Mazlûm Doğan ê Kawayê hemdemî yê li beramberî vê derdikeve û ev berxwedan piştî wî jî hîn bilintir dibe. Ne tenê berxwedaniyên Kawayên Hesinkar li beramberî Dehaqên hemdem li Bakûr, Başur, Rojhilat, Rojava heye; di heman demê de li Rojavayê Kurdîstanê qetlîamên ku Rejîma Baas jî li ser gelê Kurd kiriye dîsa gelê Kurd li berxwe daye. Gelê Kurd di dîrokê de tû caran radestbûnê qebûl nekiriye. Di heman demê de qetlîamên ku Seddam çêkiriye, dîsa Enfal heye, Qetlîama Helepçê heye û hwd. Ev hişmendiya ku van qetlîama kirî dixwestin ku di zindana Amedê de jiyanê bê wate bikin, mêjîyên ciwanên Kurd bi rêbazên nû dixwestin bira wan ya dîrokê bixitînin. Bi vê yekê mirov dikare bibêje qûrbaniyên nû çêdikirin ku Kurdê xwe nas nekin bidin avakirin. Lê di şexsê Heval Mazlûm de berxwedana zindana Amedê ya dîwaran nasnake û ya ku lehengiyê di lotika herî bilind de dide diyarkirin, tarîbûnê bi Zekiye Alkan agirê bedena xwe ronî dike. Di şexsê Heval Mazlûm de bi sedan Kawayên Hemdem bi fikir û ramanê tevna mêjîyên xwe jiyanê hûnandin û li hemberî dagirkeriyê berxwedaniya asta herî jor



## **BERXWEDANIYA RÊBER APO YA KU DI ZINDANA ÎMRALIYÊ DE LI DIJÎ DIJMIN DI HER KÊLIYÊ DE DIMEŞÎNE; WEKÎ DERBA KAWAYÊ HESINKAR YÊ KU LI DEHAQAN DAYE YE**

de pêşxistin. Ev berxwedanî di asta zindanan de nema, dibe ku roj ne di heman demê de be, lê derbeya sala 1984'an ku li dagirkeran ket; berdewamî û bersiva berxwedaniya zindanan bû. Ango keç û xortên Kurd li hemberî Dehqên serdemê berê xwe didin çiyayên Kurdîstanê. Ji bo ku Dehaqan tûne bikin ne bi yekî tenê ne; bi hezaran Kawa diafirin. Ev yek jî heqîqeta Têkoşîna Azadiyê ye. Rê û resmên ku bi ramanên Rêber APO de hatî avakirin; wateya berxwedaniyê hîn mezintir dibe. Têgeha berxwedanê jî bê gûman ne tenê êş kişandin e, "berxwedan" afirandin e! Nûjenkirin e, ferqa xwe de bûn e, xwebûn e.

### **Newroz ji bo me hêviya jiyanekî nû ye**

Her pêvajoyek li gorî serdema xwe tê bi watekirin û xemilandin. Di Tevgera Azadiya gelê Kurd de, hem di milê fikrî de hem di milê jiyanî de hem jî bi taybet di milê wekheviya navbera cinsan de, yê ku jiyan afirandîye, jiyanê bi xemil û coş kiriye, yê ku kevirê koşeyên jiyanê li ser hev û din rêz kiriye, yê ku xweşîkbûna jiyanê hûnandîye û bi wate kiriye jina Kurd e. Jina Kurd li hemberî vê di nava vî ramanê berxwedanê de hîn zêdetir bi wate dibe. Hemdemî bûn li gorî cîh û demê çerxa qirkirinê şikandin e. Dehaqên serdemê dixwestin ku bi rê û resmên cûdatir vîna gelê Kurd

tûne bikin û bi taybet jî di nava vê de vîna jin a pîroz tûne bikin. Têgeha pîroz bixwe jî avakirin e û hevpêymanî jiyana hevbeş e. Ji ber wê watebûna Newrozê di Têkoşîna Azadiyê de bi xwe hisandina Kurdperwerî ye, welatperwerî ye, nîrxdana jiyanê ye û hêvî dayîna afirandin e. Em dikarin bibêjin ku êdî girîngiya Newrozê di Kurdisatanê de gihîşte asta herî bilind. Ji ber wê jî pîrozkirina Newrozê ya vê demê bi berxwedaniya keç û xortên Kurd cûdatir bûye.

Heval Rewşen jî bi agirê bedena xwe ya ku di qeleyên dijmin jî gel re kiriye wekî dogehê, hişmendiya Dehaqê serdemê hilweşand. Ji bo vê Newroz ji bo me hêviya jiyanekî nû ye. Li hemberî tarîtiyê hûnandina jiyanekî nû ye. Bê gûman di Kurdan de ji Zerdeşt bigre heta despêka têkoşîna me de, em her li beramberî tarîtiyê ronahiyê dipejirînin û li hemberî bêbextî û qirqirîna berxwedaniyê hildibijêrin. Di Kurdîstanê de hem erdnîgariya em li ser jiyan dikin hem jî bi taybet Mezopotamya ji bo pirtûkên pîroz bûne xwedî war, xeml û bedewiya wî li vê derê havêynê xwe girtiye û herî zêde pirtûkên pîroz li ser vê erdnîgariyê hatine nivîsandin, dîsa herî zêde bawerî û hêvî li ser vê erdnîgariyê hatine afirandin, filozofên hêja yên wekî pêxemberê gelê Kurd Zerdûşt jî li ser vê erdnîgariyê bûye. Ji bo vê agir ji bo me wekî navnîşana ronahiyê ye, paqijbûnê ye. Em di-

karin bibêjin ku ev erdnîgariya ku bihiştta mirovan e ku Dehaq jî dixwazin bikin dogehên mirovan; di rûhê wî de berxwedanî heye. Dema mirov li çîroka Îbrahîm jî temaşe dike heman tişt heye. Dîsa dixwazin Îbrahîm bi agir bişewitînin lê ava ku derdikeve paqij dike wateya wî pir cûda ye. Milê xwe yê felsefîk heye, milê xwe yê bawermendî heye dîsa baweriyên xwe yê di milê rûhî de heye. Dehaqên wê serdemê jî Nemrûd bûn.

### **Newrozê li serê çiyayên Kurdîstanê geş dibe**

Herikbariya dîrokê ya ku heta roja me ya îro hatiye, bi berxwedaniya ku îro li çar perçeyên Kurdîstanê dimeşe û ji bo mirovahiyê bûye hêviyekî nû, bûye hêviya jiyanê ku gel bikaribin xwe lê bigrin, bi taybet gelê bindest li ber ronahiya vê têkoşînê, li ber berxwedaniya wî, li ber jiyan bi ramanên azadiyê hatiye hûnandin ku bikaribin xwe rêxistin bikin pêla berxwedaniyê her diçe bilind dibe. Wekî ku me gotibû Dehaqê di dîrokê de û yê niha qet ferqa xwe nîne. Me vê yekê carekî din di şexsê êrişa ku li ser Garê hatî kirin de dît. Ji bo bikaribin Newrozê li gelê Kurd tarî bikin, ji bo agirê Newrozê ku li serê çiyayên Kurdîstanê geş dibe bitemirînin û sersala Kurdan ya ku bi Newrozê re dikevin yekî ya nû dixestînin bi operasyona Garê vala derbixin, tûne bikin. Lê

çawa ku her demê Dehaq hebin lê kêleka wê herdemê Kawayên hemdemî jî hene. Kawayên me yên hemdemî jî ya di operasyona Garê de keç û xortên Kurdîstanê ne. Çerxa faşîzma ku niha li serê hemû cîhanê bûye bela ya AKP- MHP xirab bû. Perçeyekî mezin ya Dehaqên vî demê jî Kurdên xwe firoş ku ji çanda xwe dûr ketiye, bûye xwînmijê gelê xwe. Heviyên AKP- MHP jî bi vana ve girêdayî bû.

Mîrov dikare bibêje berxwedaniya Heval Şoreş û hemû hevalên wê derê berxwedaniya Kawayê Hemdemî ye. Em jî deyndarên berxwedaniya wan in. Dixwestin faşîzma ku di asta herî jor de pêş ketibû di hemû qanan de nîşan bidin û Kawayê Hemdemî tûne bikin. Lê bersiva ku li Garê hat dayîn ji ruhê dîrokê ne qût e. Ango ji pêvajoya ku em tê de jiyan dikin ne qût e. Bi taybet jî wekî Têkoşîna Azadiyê ya ku niha bi cîhanî bûye, gerdûnî bûye bi hemleya “Dem Dema Azadiyê ye” re, bersiv dan Dehaqan. Fîkrê Rêber APO gerdûnî bûye. Berxwedaniya Rêber APO ya ku di zindana Îmraliyê de li dijî dijmin di her kêliyê de dimeşîne; wekî derba Kawayê Hesinkar yê ku li Dehaqan daye ye. Tû ferqa xwe nîn e. Dehaqên serdemê faşîzma AKP- MHP ‘ye û Kawayê serdemê jî Rêber APO ye. Niha cîhan hemû xwe li ber fîkrê Rêber APO ronî dikin. Ji ber vê tecrîda li ser Rêbertî qebûl nakin, ji bo vê jî bi operasyona Garê re armanca wan ew bû ku bibêjin “êdî ev tevger nikare xwe komî ser hev û din bike”. Lê bi saya gerilayên APOyî yê Kawayê Hemdem ev xwestek û daxwaza faşîzmê têk çû û gotin di cih de be bû sedema hilweşandina desthilatdariya wan.



### Li hemberî qirkirin û faşîzmê, jiyanekî nû wê biafire

Bê gûman berxwedanî ne ev tenê ye. Berxwedaniya jinên Kurd, niha ji bo jinên cîhanê cîhê îlhamê ne. Dîsa bi vê re girêdayî berxwedaniya Rêber APO ya li zindana Îmraliyê, zindanên dewleta Tirk de ku niha bi hezaran hevalên me astekî herî jor de li berxwe didin, berxwedaniya Rojavayê Kurdîstanê ev yek hemû wate, raman û jiyanekî nû de ne. Berxwedaniya Garê herikandina berxwedaniya Heftenîn û her çar perçê Kurdîstanê de ye. Hem di warê civakî de hem jî di warê jiyanî de. Dehaqên serdemê di Rojhilata Navîn de jiyanê ji gel re kirine wekî dogehê. Yê ku herî zêde dikevin ber qirkirina vê çerxa qirkirinê jin in, zarok in, ciwan in. Yê ku li hemberî vê derdikeve, laşê xwe dike çeper, jiyan xwe ya takekesî nafikre, ji bo gelê xwe difikre, ji bo bikaribe jiyanekî hevbeş were avakirin têkoşin dike. Bi Newroza îsal ango Newroza 2633'mîn de em dikevin serdemekî nû de. Li hemberî qirkirin û faşîzmê, jiyanekî nû wê biafire. Ji ber wê em dikarin bibêjin ku Newroza

îsal, ne tenê em li serê çiyayekî agirekî pêbixin, êdî di rûh û mêjiyê mirovan de agirê ronahiyê pê bixin. Ji bo ku ev tarîtiya heyî xelas bibe. Li ser erdnîgariya wekî bihiştê ya Rojhilata Navîn de pêwîstî ronekbûnekî bivî rengî heye. Ronesansa sed-sala 21'emîn ramanê Rêber APO ya ku mirovatîyê ronî kiriye û navnîşaneyê Kawayê Hemdemî dike, Newrozekî nû bi serkeftina Garê berxwedaniya bi rûmet ku hatiye meşandin tacîdar bikin. Rê û resantiya dîroka xwe derxistina ser rûçikê erdê û geşbûna Newrozê pîrozkirin di milê Têkoşîna Azadiyê jî bi taybet wekî jin, gelek girînge. Ji ber ku herî zêde berxwedaniyê di hemû kolanan de; di deşt û zozanan de, kolanên cîhanê hemûyan de bilind dike yek jî jina Kurd e. Li ser vê esasê Newroza 2633'mîn li hemû azadixwazan û mîmarê azadiyê Rêber APO, li hemû dilên azadiyê, dilê her kesekî ku ji bo azadiyê lê dide û têdikoşin em pîroz dikin. ●●●

# KİŞİLİK DEVİRİMİ YAŞAM TARZI DEVİRİMİDİR




Önder APO hakikat devrimini yaşam tarzı devrimi olarak tanımladı. Bir zihniyet ve yaşam tarzı devrimi dedi. Peki hakikat devrimi nedir? Zihniyet devrimi ve zihniyet değişimidir. Önderlik çizgisinde yeni bir zihniyet edinmedir. Bir, hakikat algısı oluşturma, doğru bir hakikat algısı tanımına ulaşmadır. İkincisi yaşam tarzı devrimidir. İdeolojik devrimdir. O halde hakikat devrimi yapıyorsak, kendimizi hakikat devrimcisi yapacaksak, bu temelde eğitim örgütlüyorsak yaşam ilke ve ölçülerimizi gözden geçireceğiz. Onları değiştirmeyi öngöreceğiz. Bu temelde doğru yaşam tarzı Önderliğinkidir, hakikatin tanımlayıcısıdır diyoruz, o halde yaşam tarzımızı Önderliğin yaşam tarzına göre değiştireceğiz, dönüştüreceğiz. Bunun için 'Önderliğin yaşam tarzı nedir,

ne değildir, nasıl yaşıyor?' buna bakacağız, bu soruları kendimize soracağız. Önderlik 'nasıl yaşamalıyız?' diye sordu. Yıllarca bunu tartıştı, var olan yaşam tarzlarını eleştirdi, doğru olanı araştırdı, tanımladı, bir yaşam tarzı bizim için çıkardı. O halde bu yaşam tarzını öğreneceğiz, anlayacağız, bununla çelişen yaşam tarzımıza ilke ve ölçülerimize karşı mücadele edeceğiz. Yanlışlarımızı düzeltmek için somut karar alacağız. Önderliğin yaşam tarzıyla çelişen yaşam tarzımız neyse atacağız ve Önderliğinkini esas alacağız. Böyle somut mücadele edeceğiz.

Önderlik kimdir, nedir, nasıl yaşadı? 'Nasıl yaşamalı?' sorusuna ne cevaplar verdi? Önderliğin yaşam tarzı nedir? Bilinmelidir ki Önderliğin yenilmezliğini o yaşam tarzı yaratıyor. Demek ki o başarılar kendiliğinden olmuyor. Her şe-

yin temelinde yaşam tarzı var. Çünkü hakikat budur. Yaşam tarzıyla bağlıdır, yaşam tarzı da somuttur. Neyi ifade ediyor? İyi, doğru, güzel, özgürlük ölçülerimizi ifade ediyor. Neye doğru diyoruz, neye güzel diyoruz, neye iyi diyoruz, neye özgür diyoruz. Önderliğin iyi, doğru, güzel, özgürlük ölçüleriyle ne kadar bütünleşmişiz. Öyle mi yaklaşıyoruz, yoksa Önderliğin çirkin dediğine biz güzel, Önderliğin özgür dediğine biz köle mi diyoruz. İdeolojik farklılık böyle ortaya çıkıyor. Kendini uygulama, bireycilik buradan başlıyor. Önderliğe doğru katılmamak bu biçimde şekilleniyor. Böyle katılmaya çalışırsak istediğimiz kadar 'Önderlik' diyelim ya da Önderliğe katılmaktan söz edelim, Önderliğe doğru katılamayız. O halde Önderliği çok iyi incelemek gereklidir. Daha doğrusu bu tarzla eğitime



## ÖNDERLİK BÖYLE BİR BİLİNÇ VE İRADE GÜCÜ HALİNE GELEBİLMEK İÇİN YILLARCA OKUDU, İNCELEDİ, TARTIŞTI, YOĞUNLAŞTI, BUNLAR SONUCUNDA BÖYLE BİR BİLİNÇ VE İRADE GÜCÜ HALİNE GELDİ

somut yaklaşmak gereklidir.

Pratik ders çıkartmada soyut görme var, bireyin kendisini eğitmesi bilgiyle, düşünceyle özdeşleştirme durumu var. Yanlış bir durumdur. Mesela ideoloji teori ile karıştırılıyor. Somut ve katı ilkeler, bir yorum olan teori sanılıyor. Teori, bilgi birikimi olarak algılanıyor. Ne kadar çok bilgi var tekrarlıyorsa 'teoriktir' bir de 'ideolojiktir' deniliyor, dolayısıyla eğitim çok bilme olarak algılanıyor. Eğitilmiş olmak çok bilmiş olmak değildir; eğitim, gerekeni bilmek, pratiği aydınlatan bilgiye sahip olmaktır.

Evet bilgi edinmenin teorik boyutu var ama ideolojik boyutu da var. Ölçü edinme, ilke edinmedir. Ölçü ve ilke edinme ise somuttur. Pratiğe yakındır. O açıdan eğitime soyut değil de somut yaklaşmak da gereklidir. Bir yanı bilgi toplama, onları yorumlayarak bilince dönüştürme çalışması olsa da diğer yanı somut olmalıdır. Somutluktan kasık ise ilke, ölçüyle ilgili olmalıdır ve pratikle ilgili olmalıdır. Kişilik değişimi dönüşümü, devrimiyle ilgili olmalıdır. Alışkanlıklarla, davranışlarla, ilkelerle ilişkili olmalıdır. Buna 'terbiye etmek' de deni-

liyor. Bir yanı bilinç edinme, doğruları öğrenme ve pratiğe öyle bakma olurken, bir yanı da doğrular temelinde kendini yeniden şekillendirmedir. Yanlışları atıyoruz, yerine Önderliğe ait olanı koyacağız, zihniyet inşası yapacağız. Bu pratik için de böyledir. Pratikte de yaşam tarzımızı, onun ilke ve ölçülerini değiştirmeyi öngöreceğiz.

### **Birlik, Önderlikte Birleşerek Ortaya Çıkar**

Eğitimi sadece soyut bilgi edinme olarak ele almamalıyız. Somut ölçülerimizi, ilkelerimizi Önderlik ilke ve ölçülerine göre değiştirebilmeliyiz. Ölçülerimizi Önderliğe göre değiştirirsek hepimiz bir oluruz. Birlik, Önderlikte birleşilerek ortaya çıkar. Yoksa sen bana katıl, ben sana katılmam biçiminde olmaz. Peki bu konularda gerçekten Önderliğe katılmış mıyız? Bu noktada Önderlik eğitimi doğru yapmalıyız. Önderlik ilke ve ölçülerini, yaşam tarzını doğru öğrenmeli ve bilince çıkartmalıyız ve ona göre kendimizde değişiklik yapmalıyız. Önderlik dışarıda da mücadele etti, İmralı'da da mücadele ediyor. Tepeden tırnağa mücadele-

ci kesilmiş her şeyle mücadele eden bir kişilik var. Önderlik gerçeği bunu ifade ediyor. Mücadelede bu kadar ilkeli, amansızdır. İlkel birlik dışında birleşmeyen bir kişilik var. Önder APO "Ben herkesle ilkeler temelinde ilişki kuruyorum, ilkeler de ayrıştırdık mı ilişkilerimiz bitter" dedi. Bu kadar ilkeli davranan, keskin mücadele eden bir kişilik var. Önder APO'nun temel özelliğinden bahsedilirse birincisi tarih bilinci denilirse, ikincisinin mücadelecilik olduğunu bilmemiz lazım. Kendimize göre Önderlik tanımlıyoruz, aslında kendi Önderliğimizi kendimiz yaratıyoruz ve ona katılıyoruz, ölçülerimizi de ona göre oluşturuyoruz. Önderliği doğru anlayıp Önderliğe göre kendimizi değiştirmek yerine Önderliği kendimize göre değiştiriyoruz, tanımlıyoruz ve kendi somutumuzda kalıyoruz. Önderlikte somuttur, yaşamı da somuttur. O halde o somutluk içinde Önderlik ilke ve ölçülerini öğrenmeli ve özümsemeliyiz. Kendimizde böyle somut değişiklikler yapma gücünü göstermeliyiz. Önderlikle iyi, doğru, güzel, özgür ölçülerde nerede çelişiyoruz? Yaşamda, tarzda, üslupta nerede çelişiyoruz? Ön-

derlik neye güzel diyor, neye doğru diyor, nasıl yaşıyor, biz ne yapıyoruz? Önderlikle aynı mıyız yoksa çelişiyor muyuz?

Önderlik Haki arkadaş için “Benim gizli ruhum gibiydi. Bütün davranışlarımı, anlayışlarımı anlamış ve özümsemişti, ona göre hareket ediyordu. Bir-birimizin gözüne baktık mı ne demek istediğimizi anlar ve yapardı. Konuşmaya, tartışmaya, söylemeye gerek kalmazdı. Zaten sanki ben söylüyorum gibi o anlar, bilir ve yapardı.” Önderliğe demek ki böyle katılım olabiliyor. Öyle katılmak mümkün değil demek lazım. Bunun kısmi eğitimle bağı var ama daha çok katılımı bağı var. Doğru katıldın mı kendini bu temelde eğitebilirsin. Önderliğe katılımın Haki Karerce olursa öyle katılırsın ama kendine göre zayıf, biraz kenarından kıyasından kendi anlayışlarına da yer verecek şekilde katılmaya kalkarsan o zaman bin bir yerde çelişirsin. Oradan da bir karar ve irade çıkmaz. Önderlik “sizin sorunuzun anlayış ve irade sorunuzdur” dedi. İrade zayıflığı var, yeterli bir irade duruş gösterilemiyor. Bunları aşacağız. Kendimizi Önderliğe göre değiştirmekten korkmuyacağız, taklit ediyor gibi görünmeyeceğiz, kendi kişiliğimizi kaybettiğimizi, özgünlüğümüzü yitirdiğimizi sanmayacağız, tam tersine Önderlik ölçü ve özellikleriyle bütünleştikçe özgür birey ve militan haline geleceğiz. Parti ve toplum içerisinde yerimiz ve rolümüz olacak, özgür kişiliğimiz o zaman gelişecek ve açığa çıkacak, eyleme dönüşecek. Başka türlü olmaz. Bu çerçevede Önderliği anlamak ve önderliğe katılmak esastır.

### Önderlik Bir Bilinçlenmenin Sonucudur

Mücadele gücü eğitimle ortaya çıkıyor, bu kesindir. Bunu herkes de kabul ediyor, görüş birliği oluşturduğumuz bir durum oluyor. Mücadele tarihine baktığımızda da bu gerçekliği açık ve net bir biçimde görüyoruz. Fakat şunu da değerlendirmek durumundayız. Madem mücadelenin gelişiminde bu kadar yeri, rolü, etkili olan bir çalışma, o halde mücadelenin eksiklikleri de buradan kaynaklanıyor olamaz mı, bu kadar özgürlük mücadelesinin gelişiminde etkiliyse o zaman mücadeleyi zafere götürmede de çözümünü burada aramak gerekmiyor mu? Bu soru tabii ki temel bir sorudur. Cevap vermemiz de gerekiyor. Önder APO her şeyi değerlendirdi, eleştirdi. Fakat çok geniş olarak tanımladığı, ifade ettiği anlamlandırdığı eğitim çalışmaları açısından böyle bir soruyu sormaktan da geri durmadı. Savunmalarda bu da var. “Her şeyi eğitimle elde ettik” dedi ve “öyleyse yaşanan eksiklikler de eğitimden kaynaklanmış olabilir mi, eğitimi daha farklı da ele alabilir miydik?” diye sordu. Bu soru anlaşılmalı ve cevaplanmalı bekliyor, cevaplanmak üzere ortada duruyor, bizim de eğitimi ele alırken dikkate almamız gereken bir soru oluyor. ‘Nasıl bir eğitim yapmalıyız?’ sorusuna cevap ararken bütün bunlara bakmamız lazım. Mücadele tarihimize baktığımızda bazı çözümleri görsek de önümüze bu soru çıkıyor. Çünkü dikkat edilirse parti ve mücadele tarihimiz içerisinde başat olan, her dönemde geçerli ve esas olan,

etkisi hiç azalmayan, gittikçe büyüyen ve genişleyen çalışma eğitim çalışması oluyor. Bir teorik, araştırma-inceleme, bilinç oluşturma, onu propaganda etme, eğitime dönüştürme çalışmasıdır. Bu, Önderliksel çıkışın da temelidir.

Önderlikte bir bilinçlenmenin sonucudur. Önderliksel çıkış bir politik-askeri tavır değil, çok açık ki bir bilinçlenme durumudur. Tarihsel bilinç, yaşam bilinci, günümüzü anlama bilinci, dolayısıyla bunlar temelinde bugünkü yaşamı, Kürdistan’a dayatılan yaşamı sorgulama, reddetme ve yenisini arama bilincidir. Önderliksel çıkış bu temelde gerçekleşti. Önderliksel çıkış iktidar ve devlet sistemi beş bin yıllık erkek egemen zihniyete dayalı gelişimini içerse de esas olarak kapitalist modernitenin Birinci Dünya Savaşı’ndan itibaren Kürt toplumuna, Kürdistan’a dayattığı inkâr ve imha zihniyet ve siyasetini, yaşamını reddetme ve alternatifini arama, ortaya çıkartma bilinci ve iradesi oldu. Önderlik gerçeği her şeyden önce ve en fazla bunu ifade ediyor. Böyle bir duruşta bilinçlenme olayı oluyor, o da kendini eğitmek demektir, eğitimle gerçekleşiyor. Önderliğe vahi gelmedi, hazır birileri bir şey vermedi, durup dururken olmadı. Kendini eğiterek bu düzeye geldi. Kendini eğitmenin, bilinçlendirmenin zirvesini ifade etti. O nedenle Önderliksel doğuştan itibaren bilinçlenme, eğitim, hareket olarak varoluşun, gelişimin temelini oluşturuyor.

Dikkat edilirse Önderliksel çıkış için bunu net bir biçimde ifade edebiliriz. Yoksa orta-



da bir isyan yoktur, herhangi bir saldırıya karşı tepki durumu söz konusu değildir. Siyasi-askeri tutumu ifade etmiyor. Bir bilinçlenme durumunu ifade ediyor. Kürdistan'a, Kürt toplumuna, insanına dayatılan yaşamı reddetme, alternatifinin olabileceğini tasarlama ve onu arama iradesi, bilinci oluyor. Bu çok nettir. Demek ki bu da eğitimle ilgilidir. Önderlikte mevcut çıkışa kendini eğiterek ulaştı. İyi biliyoruz ki ondan sonra örgütsel ve eylemsel alandaki bütün gelişmelerini eğitimle yarattı. Çevresini eğiterek, değişik düzeylerde farklı dönemlerin özelliklerine göre eğitim çalışmalarını örgütleyip yürüterek gerçekleştirdi. Bu da bildiğimiz somut bir gerçektir.

Baştan itibaren bir Önderlik hareketsek, Önderliksel çalışmanın temelini eğitim oluşturdu. O halde başat olan çalışma eğitim çalışması oldu. Demek ki bütün işlerini esas olarak eğitim ve propaganda ile yaptı. Kuşkusuz başka araçları da kullandı. Fakat baştan beri etkili kullandığı araç eğitim oldu. Eğitim aracı olarak da dilini kullandı. Siyasette, askerlikte yaptı ama bunlar belli dönemlerde gündeme geldi, her dönemde yoktular. Etkili oldukları ama her zaman döneme damgalarını vurmadılar. Silahın en çok kullanıldığı dönemde bile ancak eğitimle birleştiği oranda silah rol oynayabildi, pratik anlam ifade edebildi, gelişme yaratabildi. Yoksa kendi başına herhangi bir gelişme yaratılamadı. Fakat eğitimi silahsız yarattı, propaganda yarattı, örgüt geliştirdi, Önderliksel çıkışı gerçekleştirdi, ideolojik grubu oluşturdu, gençlik örgüt-

lenmesini geliştirdi, partileşme esas olarak dile dayalı sözlü propagandayla gerçekleştirildi.

